RAPORA DI

# SERDEMA ŞEWBA COVÎD-19AN DE LGBTÎ+YÊN PENABER Û BINPÊKIRINÊN MAFÎ YÊN JIYANE

SERDEMA ŞEWBA COVÎD-19AN DE LGBTÎ+YÊN PENABER Û BINPÊKIRINÊN MAFÎ YÊN JIYANE

HEINRICH
BÖLL
STIFTUNG

HÊVÎ
LGBTİ

# RAPORA DI SERDEMA ŞEWBA COVÎD-19AN DE LGBTÎ+YÊN PENABER Û BINPÊKIRINÊN MAFÎ YÊN JIYANE


## AMADEKAR

Müzeyyen Araç
Selçuk Çelik
Süleyman Sayar
Viyan Melis Karakaş

## WERGER

Isla Mukheef (Arapça)
Sogol Ghaeli (Farsça)
Gökçe Katkıcı (İngilizce)
Serhad Zinar (Kürtçe)

## DÎZAYN

Gülçin Yılmaz
Yağmur Kaya



(Hezîran 2021)

Ev xebat ji aliyê Heinrich Böll Stiftung ya Nûnertiya Tirkiyê hatiye piştgirîkirin. Berpirsiyariya naverokê bi temamî aidî Komeleya HÊVÎ LGBTÎ+ ye. Ev xebat fikrên Heinrich Böll Stiftung ya Nûnertiya Tirkiyê nîşan nade.

# NAVEROK


01 DESTPÊK

02 17Ê GULANÊ DI KESAYETA LGBTÎ+ YÊN PENABER DE HEVDÎTINÊN ROJA NAVNETEWÎ YA LI DIJÎ HOMOFOBÎ, BÎFOBÎ, ÎNTERFOBI Û TRANSFOBIYÊ (IDAHOBIT)

- Çima 17ê Gulanê?
- HEVÎ LGBTÎ+ û Xebatên IDAHOBIT ên 17ê Gulanê:

03 DI SERDEMA PANDEMIYÊ DE LGBTÎ+YÊN PENABER Û BINPÊKIRINÊN MAFÎ YÊN DIJÎN

- Rêwitiyeke Bêyom; Penaber li Sînorê Edirneyê ne
- Negihîştina Dezenfektan û Maskeyan:
- Negihîştina Amûrên Ragihandinê û Binpêkirinên Mafan di warê Mafê Tenduristiyê de:
- Pirsgirêkên Aborî;
- Cûdakariya Piralî, Pirsgirêkên Psîkolojîk:

04 17Ê GULANÊ DI KESAYETA LGBTÎ+ YÊN PENABER DE HEVDÎTINÊN ROJA NAVNETEWÎ YA LI DIJÎ HOMOFOBÎ, BÎFOBÎ, ÎNTERFOBI Û TRANSFOBIYÊ (IDAHOBIT) – VI

- Çalakiyên Roja Yekem:
- Roja Yekem, Pirs û Bersivên ji Beşdaran:
- Çalakiyên Roja Duyem:
- Roja Duyem, Pirs û Bersivên ji Beşdaran:

05 DAXUYANIYA XWESTINÊN LGBTÎ+YÊN PENABER

# KURTENAV

APA: Komeleya Psîkiyatrî ya Emerîkî

ASAM/SGDD: Komeleya Piştevanî ya Penaber û Nişteciyan

BM: Neteweyên Yekbûyî

GSS: Sîgortaya Tenduristiyê ya Giştî

IDAHOBIT: Roja Navnetewî ya li dijî Homofobî, Bîfobî, Înterfobi û Transfobiyê

SGK: Saziya Ewlehiya Civakî

UNHCR/BMMYK: United Nations HighCommissionerforRefugees / Komîseriya Bilind a Penaberan ya Neteweyên Yekbûyî

YİMER: Navenda Ragihandinê ya Biyaniyan

# DESTPÊK

**Ev rapor;** di heyama pandemiya COVID-19yê de LGBTÎ+ yên penaber ku li Tirkiyê dijîn û neçar mane bijîn ji bo binpêkirinên mafî yên jiyane derxîne holê û ji bo çareserkirina binpêkirinên mafî yên di vê mijarê de ji polîtîkayên civakî re çavkanî nîşan bide hatiye amade kirin. Zanyariyên di vê raporê de cîh digirin; tecrûbeyên LGBTÎ+ yên penaber in ku başdarî çalakiyên onlîne yên "17ê Gulanê, di kesayeta LGBTÎ+ yên Penaber de IDAHOBIT" bibûn, ev çalakî di salên 2020 û 2021an de ji aliyê komeleya HÊVÎ LGBTÎ hatibû lidarxistin. Piraniya kesên ku tevlî bibûn penaberên ji rojhilata navîn û bakurê Afrîkayê hatibûn, LGBTÎ+ yên penaber ên ji bajarên cûda yên Turkiyê bûn. Ev hemî agahiyên nasnameyên di ev derê de hatine beyan kirin ji bo ewlehiya şexsî hatine anonîmkirin.

"Daxuyaniya xwestinên LGBTÎ+ yên Penaber" ku di dawiya vê raporê de cîh digire, ew jî ji çalakiya "17ê Gulanê di kesayeta LGBTÎ+ yên Penaber de Roja Navnetewî ya li dijî Homofobî, Bîfobî, Înterfobiyê û hevdîtinên rojane yên Transfobiyê-VI" ku komeleya HÊVÎ LGBTÎ+ di sala 2021an de lidarxistibû û ji aliyê aktîvîstên LGBTÎ+yên di vê çalakiyê de xebitî ne û ji aliyê LGBTÎ+yên penaber ve hatiye amedekirin. Ev daxuyaniya ku bi 5 zimanan (Erebî, Farisî, Îngîlîzî, Kurdî û Tirkî) hatiye amadekirin, hem ji rêxistinên LGBTÎ+yên li Tirkiyê çalak in û hem jî ji rêxistinên LGBTÎ+yên navneteweyî re bi rêya mailê ve hatiye parvekirin.

# 17Ê GULANÊ DI KESAYETA LGBTÎ+ YÊN PENABER DE HEVDÎTINÊN ROJA NAVNETEWÎ YA LI DIJÎ HOMOFOBÎ, BÎFOBÎ, ÎNTERFOBI Û TRANSFOBIYÊ (IDAHOBIT)

## ÇIMA 17Ê GULANÊ?

Şerê Cîhanê yê II. ; Ew cûdakarî û livîna civakî ya ku li dijî vê cûdakariyê derdikeve bi xwe re derxist holê. Ev livîna civakî, di salên 1960an de bandor li ser mirovên rastî LGBTÎ+fobiyê dihatin kir, di babetên wekî meyla cinsî û nasnameya zayendî de ji bo azadiyan wan anîne cem hevdu. LGBTÎ+yên ku dixwastin di nîzama nû ya cîhanê de pêşî li binpêkirinên mafan bigirin dest bi çalakiyên LGBTÎ+ yên bi sernavê “mafên hevzayendan” kirin. Bi van xebatan re, tundiya polîsan, dewlet û civakê ya ku LGBTI + pêrgî dihatin bêhtir hat xuyakirin.

Li Amerîkayê di sala 1969an de erîşa li ser bara bi navê “StonwallInnê” û di vê erîşê de tundiya li LGBTÎ+yan hate kirin wan bi girseyî xiste nava tevgereke xweparastinê.[1]Ev bûyera ku di medyaya navneteweyî de cihê xwe girt ji bo nîşandana binpêkirinên mafên LGBTÎ+yan bû xaleke girîng. Vê bûyerê, ji aliyekê ve rêxistinên civakî yên sîvîl ên aktîvîzma mafên hevzayendî û azadiya zayendî şopandiye û ji aliyê din jî xebatên zanistîyên hatine kirin şopandine. Ji ber vê yekê di sala 1973an de, Komeleya Psîkiyatrî ya Amerîkî (APA) biryar da ku “hevzayendî bi xwe tenê pîvanên nexweşiya giyanî nîşan nade” [2]û hevzayendiyê ji nava “Pirtûka Dîagnostîk û Îstatîstîkî ya Bêserûberiyên Giyanî” hate derxistin. Di 17ê Gulana 1990an de, Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê bi pejirandina kongreyê ve “hevzayendîtiyê” ji kategoriya nexweşiyên giyanî derxistiye. [3]17ê Gulanê, dema ku di warê mafên LGBTÎ+ de destkeftiyên girîng hatin girtin; li Tirkiyê û gelek welatên din, ev roj ji aliyê rêxistinên civakî yên sîvîl ku di qada LGBTÎ+yan de dixebitin wekî roja li dijî Homofobî Bîfobî Înterfobî û Transfobiyê (IDAHOBIT: İnternational Days Aganist Homophobia Biphobia InterphobiaTransphobia) tê pîroz kirin.

[1]https://news.harvard.edu/gazette/story/2019/06/harvard-scholars-reflect-on-the-history-and-legacy-of-the-stonewall-riots/ 24.05.2021

[2]https://www.nytimes.com/1973/12/16/archives/psychiatrists-in-a-shift-declare-homosexuality-no-mental-illness.html 24.05.2021

## HEVÎ LGBTÎ+ Û XEBATÊN IDAHOBIT ÊN 17Ê GULANÊ:

HEVÎ LGBTÎ+ di sala 2013an de di babatên nasnameya zayendî, meyla cinsî û zayenda civakî de dest bi xebatên xwe kiriye. HEVÎ LGBTÎ+ berdewamkirina xebatên xwe di kesayeta LGBTÎ+yên Kurd, HIV û stîgmatîzasyonê dike, piştî ku di sala 2015an de bû komele; xebatên xwe yên di mijarên koç û LGBTÎ+yên penaber de zêdetir kirine.

Di sala 2010an de li welatên Efrîkayê û Rojhilata navîn tevgerên siyasî û polîtîk ên bi navê “Bihara Ereban” dest pê kir, di encama van bûyeran de pêlên koçê yên nû dest pê kirin û LGBTÎ+ yên pêrgî binpêkirinên mafî hatine bûne perçeyeke girîng a vê tevgerê. Wekî komele dema ji bo LGBTÎ+yan li qadê her ku çalakî çêdibin, LGBTÎ+yên li Tirkiyê dijîn, yên ku neçar mane bijîn hem li rastî LGBTÎ+fobiyê tên hem jî rastî nîjadperestiyê tên û hatiye dîtin ku neçar mane tena serê xwe tekoşînê li hember vê cûdakariyê bikin. [4]Xebatan, da ye xuyakirin ku sekinandina wexteke dirêj a LGBTÎ+yên penaber li Tirkiyê, tenê ne ji ber nasnameya zayendî, bêzayendîbûn û meyla cinsî ye, derketiye holê ji ber navê welat, dîn, mezheb û çanda welatê ku jê hatine jî rastî cûdakariyê hatine. Di dema xebatan de, hatiye dîtin ku di derbarê van cûdakariyên piralî de tu pêvajoyek hiqûqî nehatiye destpêkirin û nedane destpêkirin.

Komeleya HEVÎ LGBTÎ+, 17ê Gulanê ji sala 2016an şûn ve di kesayeta LGBTÎ+yên penaber de “roja nawneteweyî li dijî Homofobî Bîfobî Înterfobî û Transfobiyê” pîroz dike. [5]Di dîroka 17ê gulana 2016an de penaber, aktîvîstên LGBTÎ+ yên koçber û HEVÎ LGBTÎ+ bi hev re ji bo balê bikşînin ser binpêkirinên mafan belavokên destan ên pirzimanî (Kurdî, Erebî, Farisî, Tirkî, û Îngîlîzî) IDAHOBIT amade kirin. Bi wan belavokên destan ên hatine amadekirin re balê kişandine ser LGBTÎ+fobî, nîjadperestî û cûdakariyê ku penaber û LGBTÎ+yên penaber rû bi rû mane. Beriya pandemiya Covid-19, LGBTI+yên penaber ên ku li ofîsa komeleyê dihatin ba hev çalakiyên haydarkirinê bi gelek zimanan (Erebî, Farisî û Kurdî) lidardixistin. Ji bilî çalakiyên agahdarkirinê yên LGBTÎ+yên penaber, ji bo ku LGBTÎ+yên penaber neyin tecrîd kirin û fobiya civakî bê kêm kirin bi LGBTÎ+yên penaber re gerên botê yên “Antî-Fobîk” hatin organîzekirin. [6]Komeleya HEVÎ LGBTÎ+, ji bo têkoşîna li dijî pirsgirêkên LGBTÎ+yên penaber heya beriya serdema pandemiyê çalakiyên bi vî rengî yên temamker ên derûnî-civakî domandin.

[3]https://www.apa.org/pi/lgbt/resources/against-homophobia

[4]https://tr.boell.org/tr/2019/09/18/lgbti-alaninda-irkcilik-ile-mucadele-egitim-programi-raporu

[5]https://www.sivilsayfalar.org/2017/05/11/17-mayis-homofobi-transfobi-karsitligi-gununde-multeci-lgbtiler-bulusmasi/ 24.05.2021 https://kaosgl.org/haber/hevi-lgbti-17-mayis-ta-multeci-lgbti-lari-konusmaya-cagiriyor 24.05.2021

[6]http://hevilgbti.org/hevi-lgbti-dernegi-3-defa-multeci-lgbtiler-ozelinde-17-mayis-homofobi-transfobi-karsiti-bulusmasi-gerceklesti/ 24.05.2021

# DI SERDEMA PANDEMIYÊ DE LGBTÎ+YÊN PENABER Û BINPÊKIRINÊN MAFÎ YÊN DIJÎN[7]

## RÊWITIYEKE BÊYOM; PENABER LI SÎNORÊ EDIRNEYÊ NE:

Bi destpêkirina COVID-19 re paralel, di Kanûna 2019an de nûçeya serbestkirina derbasbûn a ji Tirkiyê bo Ewropayê hatiye belav kirin. Piştî hatina nûçeyan LGBTÎ+yên penaber jî tevlî vê tevgerê bûne. Penaber, ji aliyên fîrma yên otobusan ve tên ser sînorê Edirneyê. Penaberên ku hatin veguhastin diyar kirin ku "fîrmayên otobusan ramanek çêkirine ku sînor bi tevahî hatine vekirin û ew ê di deriyên sînor re derbas bibin bêyî ku tu astengî bibînin." [7]"Di Kesayeta LGBTÎ+yên Penaber de Civîna IDAHOBIT ya 17ê Gulanê" ku me di sala 2020an de li dar xistibû, LGBTÎ+yên penaber binpêkirinên mafî yên wê demê jiya ne bi kurtasî wiha rêz kirine:[9]

> **"TU ÇÛ SÎNOR, TEQEZ TU BI COVIDÊ KETÎ YE, NIKARIM TE BIGIRIM MALA XWE, EZ TENDURISTIYA XWE DIFIKIRIM..."**

*Di dema pandemiyê de me qeyraneke din jî jiya: Qeyrana vekirina sînoran û çûyîna penaberan ser sînoran. Di şevekê de hevalên me yên LGBTÎ+ yên penaber xaniyên xwe girtin. Tiştên xwe bi pereyeke hindik firotin, berê xwe dan sînor. Dema vegeriyan ne xaniyê wan hebû ne jî tiştên wan. Ji aliyê derûnî ve di rewşeke pir xirab de bûn. Vegera ji sînor ji ber rastî dema pandemiyê hat, ji aliyê hevalên xwe jî rastî cûdakariyê hatin. Rastî peyvên wekî "Tu çû sînor, teqez tu bi Covidê ketî yî, nikarim te bigirim mala xwe, ez tenduristiya xwe difikirim…" hatin. Gelek mirov li rastê man. Îzaha kiryarên nemirovane ku li sînor jiyan e nemimkun e. Her kesên ku ji sînor vegeriyane mekanîzmayê wisa vedibêjin: Heremek di navbera sînorên Yewnanîstan û Tirkiyê de dima hebû. Pir*

---

[7]Di vê beşa raporê de ji çalakiya Di Kesayeta LGBTÎ+yên Penaber de Civîna IDAHOBIT ya 17ê Gulanê ku di sala 2020an de hatibû li dar xistin ku sûd ji tecrûbeyên LGBTÎ+yan hatibû girtin, hatiye amade kirin. Ji bo venêrîneke berfireh, hûn dikarin biçin malpera me www.hevilgbti.org

[8]https://amnesty.org.tr/public/uploads/files/S%C4%B0YAS%C4%B0%20B%C4%B0R%20OYUNUN%20ORTASINDA%20KALANLAR-FINAL.pdfS.4 -24.05.2021

[9]http://hevilgbti.org/17-mayis-multeci-lgbtilar-ozelinde-idahobit-kapsaminda-5-kez-bir-araya-geldik/ 24.05.2021

*kesên ji deriyên Turkiyê derbas dibûn li ew derê dihatin cem hev. Ji ber deriyê Yewnanîstanê girtîbû li ew derê asê diman û dixwastin paşvegerin Tirkiyê. Li ber derî dokumenta paşvegerê dihatin destnîşan kirin. Kesên ku vê dokumentê destnîşan kirine derbarê wan de pêvajoya edlî dihate destpêkirin. Kesên ji derva dinêrin û nakevin vê qadê van tiştan bo me vediguhêsin. Kesên li sînor bêhtir Afganîstanî, îranî û Sûriyeyî bûn. Dikarîbûn bi tirkî biaxiviyana lê nikarîbûn bi tirkî binivîsandana. Ji ber nizanîbûn bixwandana ew dokumentan –nizanîbûn çiye- destnîşan dikirin. Derûniya kesên vedigeriyan pir xirab bû. Dema ji welatên xwe hatibûn Tirkiyê her tiştên xwe wenda kiribûn. Li ev derê jî bi zehmetî pergalek ava kiribûn. Bi vê operasyonê dîsa her tiştên xwe wenda kirin. Ber bi hêviyeke din çûbûn lê ew jî li valahiyê derket. Encam: Sifir. Ez wisa nafikirim ku ev rasthatinek e ku zêdebûna hewildanên xwekuştinê bi vê pêvajoyê re hevdem e. Kesên ku çûn sînorê Edirneyê van pirsgirêkan dîtîn. Lêbelê kesên neçûn û man jî bi qasî kesên çûn hatin lînçkirin. Mesela li Samsunê, malên kesên biyanî hatin îşaretkirin. Xwediyên malan, wan bi lêxistînê ji malên xwe qewirandin. Xwediyên malan, ji wan re digotin “sînorê Edirneyê hîn vekirî ne, di ew derê de biçin.” Li kargehan, gotinên wekî “sînor vekirî ne, qey hûn naçin, êdî dev ji Tirkiyê berdin” dihatin gotin. Me jî, mînakeke vê rewşê li firineke ku em mişteriyê wê yê daîmî bûn me jiya, ji me re hate gotin “Hûn çima neçûn; qey hûn naçin.” Dema me got em naxwazin biçin jî, gotin “hûn bêşeref in, beriya hûn nehatibûn Tirkiyeya me baş bû. We li welatê xwe şer bikira, şer bikira û bi şerefa xwe bijiya.” Em niha jî van tiştan dijîn. Ez 4 salan van tiştan li ev derê her roj dijîm. Cûdakarî û LGBTÎ+fobî her gav hebû. Lê di dema pandemiyê de zêdetir bû. Bi taybetî jî di kesayeta penaberên îranî de zêdetir bûye. Derketina Covîdê ya berê Tirkiyê li Îranê wekî sedem hate nîşandan. Sankî wekî vayrosa koronayê di xwîna me de hebe, ji ber ku em îranî ne divê bi me temas nekirina tevdigeriyan. Vana tenê gel nekir. Ji vê celebên cûdakarîyan, li saziyan, nexweşxaneyan û dermanxaneyan bi awayeke vekirî me her jiya. Piştî daxuyaniyên Diyanetê, cûdakarî û zext zêdetir bûn.*

## NEGIHÎŞTINA DEZENFEKTAN Û MASKEYAN:

Di serdema pandemiyê de, penaber û bi taybetî jî LGBTÎ+yên penaber cûdakarî dîtine di gihîştina alavên parastinê de ku ew hewce ne xwe ji şewba Covid-19 biparêzin. LGBTÎ+yên penaber ên ku em wekî onlîne hatibûn cem hev; wan gotibûn ku ew hatine neçar kirin ji bo dezenfektan û tiştên parastinê yên din bihayek giran bidin û bi zor dikarin xwe bigihînin maskeyan. Yek ji LGBTÎ+yên penaber bi kurtasî rewşê wiha vegotiye:

*“Covîd hat; her kes ji kar hat avêtin. Beriya pandemiyê kesek tişteke kom nekiribû; jixwe pereyê ku dihat dayîn têra komkirinê jî nedikir. Kirê pir bihabûn. Di malekê de 5 kes bimana jî hêzake aborî çênedibû ku kirê bidin. Di dema pandemiyê de tişta din a ku em rastî hatin ew jî bihabûna dezenfektanan bû. Kolonyayên heta do me bi 2 tlyî ji bo malê distendin bihaya wan di vê pêvajoyê de pir giran bûn; mirovan nedikarî kolonya bistenda. Di belavkirina maskeyan de pirsgirêk derketin. Penaberan nikaribûn xwe bigihiştana maskeyan. Meriv nedikarî derketana derve. Beriya Covîdê jixwe penaber rastî hin cûdakariyan dihatin. Li ser covîd jî derket penaber bêhtir di malê de asê man. Jiyana covîdê, jiyana me ya civakî sînordar kir.”*

Ji bilî ev tecrûbeya li jor cîh digire ji meha gulanê ve, bi qedexeya firotina maskeyan[10] ku ji hêla rayedarên dewletê ve di 6ê Avrêla 2020an de hatibû ragihandin, bi vê gihîştina maskeyan ya LGBTÎ+yên penaber û penaberên neqeyidkirî, ku nikaribûn bigihîjin PTT û e-devletê, hema hema bi tevahî ji holê rabû. Di vê pêvajoyê de, ji bo maske, dezenfektan û pedan penaberên ku serî li Komeleya HÊVÎ LGBTÎ+ dabûn, ji bo pêdiviyên lezgîn ên penaberan bên kirin, “kelên piştgiriyê yên pandemiyê” hatin amadekirin; Van kelûpelên hatine amadekirin radestî 276 LGBTÎ+yên penaber ên li 22 bajarên cûda dijîn hatine kirin.[11]

[10]https://www.trthaber.com/haber/gundem/cumhurbaskani-erdogan-parayla-maske-satisi-yasaktir-473655.html 24.05.2021

[11]http://hevilgbti.org/pandemi-destek-paketlerimiz-yola-cikti/ 24.05.2021

## NEGIHÎŞTINA AMÛRÊN RAGIHANDINÊ Û BINPÊKIRINÊN MAFAN DI WARÊ MAFÊ TENDURISTIYÊ DE:

Di Kanûna 2019an de, guhertin di Zagona Parastina Navneteweyî û Biyaniyan de hate kirin, ev zagon mafên penaberên ji statuyên cihêreng li Tirkiyê diyar dike. Ji van guhertinan yek jî derbarê sîgortayên tenduristiyê ya penaberan de bû. Bi vê verastkirina nû re; mafê sîgortaya tenduristiyê ya giştî ku ji xwediyê serîlêdanên parastina navneteweyî re tê dayîn bi salekê hate sînordarkirin. Rêberiya Koçê vê rewşê di malpera xwe de wisa daye xuyakirin “li gorî peymana qanûnê, sîgortaya tenduristiyê ya giştî ya xwediyê serîlêdanên parastina navneteweyî û kesên xwedan statu yên ji 18 salî mezintir, ku ji roja qeyidkirinê ve salekê li welatê me temam kirine, hatiye bidawîkirin.” [12]

Weke ji veguhastina rasterast a LGBTÎ+yeke penaber ku beşdarî lêkolînan bûye tê fêhm kirin ku, binpêkirinên mafan û pirsgirêkên pêwendîdar ên LGBTÎ+yan di dema pandemiyê de zêdetir bûne. LGBTÎ+yên penaber di gihîştina mafê tenduristiyê de, di serdema pandemiyê de pirsgirêkên wan berdewam kirine.[13]

*“Hîn beriya ku pandemî dest pê bike ji bo penaberan pirsgirêk zêde bibûn. Mesela di mijara qartên telefona de pirsgirêk derketin. Qartên telefonan ên ku ji bo mirovên xwedî nasmameya biyanî bûn dihatin firotin tenê ji bo 3 mehan dihate vekirin. Ev qartên telefonan ên biwext jî tenê ji bo kesên pasaporta wan hebû dihatin firotin. Kesên bêqanûnî dihatin welat êdî nikarîbûn ji Turkcell û Turk Telekomê qartên telefonan bistînin. Hûn dizanin jixwe tiştek weke sîgortaya tenduristiyê li holê nemabû. Di vê mijarê de tu tiştek ji bo amadehiya pêşî nehatibû kirin. Lêlebê kesên bi nexweşiyên kronîk hene, mirovên bi nexweşiya HIVê re dijîn hene… Ev pêkanîn her kesî matmayî hiştibû. Di dema girtina randevuya doktoran de pirsgirêk derketin. Mirovên ku pirsgirêkên tenduristiyê bi wan re hebûn û divê dermanan bikarbianîyan rastî pirsgirêkan hatin. Piştre, Rêvebiriya Koçê ya Bajêr vê bûyerê nerm kir. Li ser raporan dest bi vekirina sîgortayan kirin. LGBTÎ+yên penaber ên jixwe tengasiyên aborî didîtin hewce man ji bo raporê bistînin nêzîkî 100 TL bidin. Dibe ku 100 TL biçûk were dîtin lê ji bo penaberan mîqdareke bilind e. Girtina sîgortayan… Pirsgirika ragihandinê…”*

[12]https://www.goc.gov.tr/uluslararasi-koruma-kapsamindaki-yabancilarin-genel-saglik-sigortalari-hakkinda 24.05.2021

[13]https://www.stgm.org.tr/e-kutuphane/multeci-lgbti-saglik-hakki-ayrimcilik-raporu 01.06.2021

## PIRSGIRÊKÊN ABORÎ;

Bi şewba Covid-19an ku hema hema li tevahiya cîhanê bandor kir, bi vê re LGBTÎ+yên penaber ji kar hatin derxistin. Kesek ji LGBTÎ+yên penaber vê rewşê wiha vedibêje:

*“Beriya pandemiyê, li bajarên ku em li cafeyên wan dixebitin miişterî kêm bibûn, ev rewş dibû sedema ji kar avêtina penaberan. Lê cihê ku LGBTÎ+yên penaber lê bixebitin tenê cafê bûn. Jixwe ji bo penaber xuya nebin wan di mitbaxan de didan xebitandin. Me bi van pirsgirêkan dest bi serdema pandemiyê kir.”*

## CÛDAKARIYA PIRALÎ, PIRSGIRÊKÊN PSÎKOLOJÎK:

*Van hemî binpêkirinên mafan bi xwe re pirsgirêkên derûnî jî tînin. Keseke/î din a LGBTÎ+yên penaber jî vê rewşa dema pandemiyê wiha vedigot: “Pirsgirêkên derûnî hezar qat zêdetir bûn. Helbet bandora pandemiyê li ser her kesî bû; lêbelê LGBTÎ+yên penaber, karkerên seksê û kesên bi HIVê ketine zêdetir li ser wan bandor kiriye. Di vê serdemê de hewla xwekuştinê(întîxar) zêdetir bûnê. Ji ber: Di malê de yî. Naxebitî. Ji bo ku tu pirsgirêkên xwe bifikire gelek wextê te heye. Û, tu dawî li jiyana xwe tîne. Ya ku me bêhtir xemgîn kir jî birçîbûn bû. Me dev ji kirê ya xanî berda. Hinek heval di sînorê birçîbûnê de ne. Penasebûna vê zor zehmet e. Dibe ku em li cihê mirovahî diqede ne. Beriya ji bîr bikim divê lê zêde bikim ku Bankeya Ziraatê diyar kir bi tu awayî ew ji bo penaberan nikarin hesaban vekin. Jixwe hejmara bankayên ji bo penaberan hesab vedikirin kêm bûn. Bankayên taybet ji bo her kesî hesab vedikirin lê ji bo kesên di bin parastina navneteweyî û parastina demkî de bûn hesab venedikrin. Bankeya Îş a Tirkiyê tenê ji bo kesên baş dizanîbûn tirkî an jî îngîlîzî hesab vedikirin. Di pêvajoya pandemiyê de ji bo penaberên ku gumana varyos a covîdê bi wan re hebûn xizmetên tenduristiyê bûn belaş. Li bajarê ku em lê dijiyan wekî ez dizanim ji LGBTÎ+yên penaber kesek gumana vayrosa covîdê nîşan nedan lê bi me hemiyan re ew tirs hebû. Hevalên me yên dermanên psîkiyatriyê bikardianîn zehmetiyan didîtin, nikarîbûn randevû bigirtana. Di gihîştina dermanan de pirsgirêk derketin, piştre çareseriyek hate dîtin. Li bajarê ku em lê dijiyan LGBTÎ+yên penaber ên ku bi gumana vayrosa covîdê çûne nexweşxanê, me agahiya ku ew rastî cûdakariyê hatine nestend, lê me bihîst ku li bajarên din cûdakarî hatiye kirin.”*

# 17Ê GULANÊ DI KESAYETA LGBTÎ+ YÊN PENABER DE HEVDÎTINÊN ROJA NAVNETEWÎ YA LI DIJÎ HOMOFOBÎ, BÎFOBÎ, ÎNTERFOBI Û TRANSFOBIYÊ (IDAHOBIT) - VI[14]

## 1.ÇALAKIYÊN ROJA YEKEM:[15]

**Parêzer Hayriye Kara:** Beriya her tiştî, berî ku dest pê bikim ji bo ku ev derfetê dan min sipasiya  Komeleya HÊVÎ LGBTÎ+yê dikim. Navê min Hayriye Kara, ji sala 2010an ve di qada mafên LGBTÎ+yên penaber de dixebitim, di heman demê parêzer im jî. Bi gelemperî ez ê behsa mafên qanûnî bikim. Ez ê behsa guhertinên herî girîng ên Qanûna Parastina Navneteweyî Û Biyanîyan Hejmar 6458an ku di meha kanûna 2010an de hatiye çêkirin bikim û bê ka çewa derbasî piratîkê bûye ez ê ji we re vebêjim. Piştre jî tiştên ku beşdarvanan dixwazin behs bikin û pirsên wan ên derbarê mjarên herî zêde meraq dikin de dixwazim bibersivînim. Wisa difikirim em li ser tiştên ku beşdarvanan meraq dikin biaxivin dê bêhtir bi kêr be.

Bandora herî mezin a guhertina di sala 2019an de derdikeve hemberî me ku guhertinên li ser mafê tenduristiya penaberên di bin Parastina Navneteweyî de ne. Ev guherînan, sûriyeyî yên di bin Parastina Demkî de ne nagire nava xwe. Lêbelê penaber; bê cûdahî xwediyê serîlêdanên parastina navneteweyî, xwediyên statû yên parastina navneteweyî (penabertî ya bişert) piştî ku qeyd bûn di nava salekê de dikarin ji sîgortayê sûd bigirin. Kesên ku prîmên sîgortayê bi xwe didin û kesên di bin parastina navneteweyî de ne piştî saleke wan biqede aktîvasyona sîgortayê bi dawî dibe, nikarin ji sîgortayê sûd bigirin.  Ji bo kesên ku bixwazin ji sîgortayê sûd wergirin divê bi daxwaznameyê serî li Miduriyetên Rêveberiyên Koçê yên Bajêr bidin û divê ev serîlêdanên wan erênî bên bersivandin. Ev ji bo sûriyeyî yên li Tirkiyê di bin parastina demkî de ne derbas nabe. Evan heta nikarîbin prîmên xwe bidin jî dikarin ji sîgortayê sûd wergirin.

[14]Di ev çalakiyên "di kesayeta LGBTÎ+ yên Penaber de Hevdîtinên Roja 17ê Gulanê (IDAHOBIT) –VI"an de ku di raporê de cîh digirin di civînên li ser LGBTÎ+yên penaber û binpêkirinên mafan de, bi alîkariya parêzerê KAOS GLyê Hayriye Kara ku di qada hiqûqî ya LGBTÎ+yên penaber de dixebite hatiye amadekirin. Ji bo van alikariyên wê em sipasiya xwe lê dikin.

[15]Çalakî di dîroka 15.05.2021an de bi zimanê erebî û tirkî wekî online hatiye lidarxistin. Navenda  mijara van çalakiyan ji LGBTÎ+yên penaber ên ku ji Sûriyeyê û ji welatên din yên Ereban koçî ev derê kirine hatiye pêkanîn.

Zarokên di bin Parastina Navneteweyî û Penaberên Bi Hewcedariyên Taybet de ne dikarin salekî ji sîgortayê sûd werbigirin. Baş e ev kesên Bi Hewcedariyên Taybet kî ne?

Qanûna Parastina Navneteweyî û Biyanîyan kesên bi hewcedariyên taybet wisa pênase dike; zarokên bitenê, kesên xwedî asteng, pîr (îxtiyar), jinên ducanî, dê-bavên tenê û bi zarok, îşkence, kesên piştî bûyera erîşa zayendî yan jî erîşa zayendî ya derûnî û fîzîkî sax mane diyar dike. Li gor qanûnê, di sûdwergirtina maf û karûbaran de pêşanî tê dayîn. Bi taybetî, LGBTÎ+ ew kes in ku divê di pênaseya kesên xwedan hewcedariyên taybet de cîh bigirin. Guhertina herî erênî ya ku di Qanûna sala 2019an de hatî kirin guhertina ku di xala sererastkirina dersînorkirinê de hatiye kirin e. Li gor vê qanûnê, îtîraza ku ji bo biryara dersînorkirinê hatibe kirin, bê nihêrîna biryara pêwîstekî, heta biryara dadgehê dayîna sekinandina dersînorkirinê ye. Lêbelê wextê îtiraza ji bo biryara dersînorkirinê ji 15 rojan daxistine 7 rojan û têkildarî dersînorkirinê pêkanînên neqanûnî tên jiyîn.

## ROJA YEKEM, PIRS Û BERSIVÊN JI BEŞDARAN:

**Ma ji bo serîlêdana penaberiyê bê kirin divê meriv Sûriyeyî be? Ez Lubnanî me û 8 meh e wekî îlegal li Stenbolê dimînim. Ji ber nasnameya xwe ya zayendî naxwazim vegerim Lubnanê û dixwazim li Stenbolê bimînim. Dikarim serîlêdana penaberiyê li Tirkiyê bikim û li Stenbolê bijîm? Ez li welatê xwe zewicîm du zarokên min hene û veqetiyam. Zarokên min jî bi min re li Stenbolê dijîn. Ji bo xwestina bicîhbûna min a li Stenbolê, wê bandora hebûna du zarokên min li ser hebe? Û zarokên min ji bo fêrî zimanê tirkî bibin diçin dibistanê. Ez jî li vê derê di kargehekê de dixebitim, wê bandora van faktoran çi qas -erênî yan neyînî- ji bo serîlêdana min a penaberiyê bibe?**

- Ji bo serîlêdana xwastina bicîhbûnê divê hûn derbasî wî welatî bibin. Hûn dixwazin serîlêdana penaberiyê li kîjan welatî bidin divê hûn li wî welatî bin. Ger hûn niha li Tirkiyê bin, hûn dikarin serîlêdana penaberiyê li Tirkiyê bidin, hûn nikarin serîlêdanê li Almayayê bidin.

- Pergala penaberiyê ya li Tirkiyê, li cîhanê minaka wê li tu welatî tuneye. Peymana Cenevreyê ya sala 1951an, peymana yekem e ku mafê penaberiyê derbarê statuya qanûnî ya penaberan de pêk aniye.

- Li gorî vê peymanê, mirovên ku ji ber nijad, dîn, netew, aidiya endamtî ya komek civakî û fikra siyasî ji aliyê welatê lê dijî yan di bin parastina wî welatê ku lê îkame dike, rastî zordarî were yan jî tirsa zordarî ditînê li ser hebe dikare serî li penaberiyê bide.

- Tirkiye aliyeke Peymana Cenevreyê ya sala 1951an e. Ji ber vê peymanê aliyeke Protokula New Yorkê ye jî ku ev di sala 1967an de hatiye destnîşankirin. Lêbelê Tirkiye îtîrazeke erdnîgarî li vê peymanê zêde kiriye; li gor vê Tirkiye ji bilî kesên ji welatên Endamên Konseya Ewrûpayê ne statuya penaberiyê nade wan kesan.

- Tirkiye, penaberên ku ji derveyî welatên endamên Konseya Ewrûpayê ne tên dibêje: “Ez ê serîlêdana te ya penaberiyê hildim, binirxînim û statuya penaberiyê ya bişert bidim. Heta ku tu derbasî welateke ku tu lê bi temamî bimînî ez destûrê didim te tu li ev derê bimînî”.

- Em van rewşan bidin berçav dikarim vê pirsê wisa bibersivînim; Tu dikarî li Tirkiyê serîlêdanê bike lê piştî ku te serîlêdana xwe kir wê bi te re mulakateke çêkin. Di mulaqatê de; pirsên wekî sedemên serîlêdana te, ji ber çi te dev ji welatê xwe berda ye, bingeha tirsa te ya zordariyê heye, tu zordariyê dibînî? ji te bê pirsîn. Di mulaqatê de van hemî pirsan bi hev re tên nirxandin.

- Piştî nirxandinê pêvajoya bicîhkirina welatê sêyem tê destpêkirin. Lê welatê sêyem nemecbûr e ku ji Tirkiyê penaber hilde. Prosedura te ya li Tirkiyê bi dawî bibe jî, welatê sêyem beriya ku te hilde prosedura xwe birêve dibe. Ji ber vê yekê ne girîng e ku ew welateke sînor e an na. Yanî her gav tenê ev tişt tên gotin; penaberî mafek e lê bicîhkirin ne mafek e. Di bicihkirinê de dînamîkên cûda hene. Carinan welat kota vedikin, carinan jî dikare hilnede. Li cîhanê niha qeyranek berdewam dike. Qeyraneke mezin a penaberan li ser rûyê cîhanê ku cîhan pê re rûbirû maye. Niha bicîhkirin pir kêm çêdibe û di navbera prosedur ên welatan de pir cûdahî hene.

- Kesên LGBTÎ+ ji ber nasnameya xwe, hem li welatên ku hemwelatiyê wê ne û hem jî li welatên ku îkameta wan lê ye ji bo îxtîmala rastî zordariyê werin di bin krîtera “Aîdî Komeke Civakî ya dîyar” dikarin xwestina stariyê bikin. Divê gotinên LGBTÎ+yan bên esasgirtin. Serîlêdan penaberiyê yên LGBTÎ+yan ne li ser meyla wan a zayendî û nasnameya zayendî yanî li ser delîla nîşandayîna LGBTÎ+ ne yan

na neye kirin, divê li ser ka ji ber nasnameya xwe rastî zordariyê hatiye yan na û li ser bingeha tirsa zordarî ya ku ji ber sedemek adil were nirxandin.

- Piştî serîlêdanê ji bo mulaqata diyarkirina statuyê jî divê ev wisa be. Divê ev jî bê gotin, li Tirkiyê hîn kesek rastî rewşeke wisa nehatiye lê biryareke dadgeha Bilind ya li Îngîlîstanê daye heye. Îngîlîstan, pênase yên Queer û bêzayendbûn jî ji bo penaberiyê wekî sedemeke derbasdar dipejirî ne. Queerbûn û bêzayenbûn jî sedemeke penaberbûnê ye û di bin gefa zordariyê de ye. Ev serkeftina hiqûqî, serkeftina tevgera qanûnî ye. Ev hemî tiştên min gotin, ji bo kesên di bin parastina navnetewî de ne dibêjim. Hemî Sûriyeyî di bin Parastina Navneteweyî ya Demkî de ne û nikarin serîlêdana Parastina Navneteweyî bikin.

- Di mijara bicîhkirina sûriyeyîyan de pir prosedurên cûda hene. Li Tirkiyê ji bo kesên di bin Parastina Navneteweyî de ne 62 bajar hene lê îkamet bikin. Niha Stenbol ne di nav 62 bajaran de ye. Li gor qanûnê dema we serî li Stenbolê da hûn nikarin li Stenbolê bimînin. Ji bo hûn li Stenbolê bimînin divê sedemên we yên derbasdar hebin. Nafikirim ku perwerdehiya zarokan a li Stenbolê bibe sedemeke derbasdar ji bo mayîna li Stenbolê. Lêbelê ger destûra we ya xebatê hebe û kargeha ku hûn lê dixebitin li Stenbolê be ji bo mayîn û qeydkirina li Stenbolê hûn dikarin serîlêdana xwe bikin. Lê ger bê destûra xebatê hûn li Stenbolê bixebitin ev wekî sedemeke naye pejirandin.

**Di kesayeta penaberên temenê wan 65 salî û mezintir de bin mafê sûdwergirtina sîgortaya tenduristiyê tu guhertin çê dibe?**

- Penaber bi xwe dikarin prîmên sîgortaya xwe bidin, sîgortaya tenduristiyê ya taybet dikarin çê bikin li pêşiya ev tiştî astengiyeke hiqûqî tuneye. Mijara ku em li ser disekinin jiyîna tengasiyên penaberên hêza wan a aborî tuneye û nikarin prîmên xwe yên sîgortayê bidin. Hem dikare prîman bide û hem jî hêza wî/ê ya aborî hebe bixwaze dikare li her nexweşnayê tedawî bibe. Li gor qanûnê ji bo kesên temenê wan 65 salî û zêdetir, di aktîvasyona sîgortayê de yan jî di mijara xwedî sîgortabûnê de sînora temen tuneye. Li gor qanûnê jixwe divê kesên temenê wan 65 salî û zedetir be û xwedî hewcedariya taybet be sîgortaya wan naye sekinandin. Ger ne xwedî hewcedariya taybet be, nexweşiyeke kronîk hebe û ger hewce ye tedawîkirin bidome têkilî van tiştan divê bi daxwaznameyekê re serîlêdana xwe bike. Heman pêvoja ji bo wan jî derbas dibe. Di qanûnê de kesên pîr (îxtiyar) wekî kesên xwedî hewcedariya taybet hatine nîşandan.

**Dixwazim wekî penaber destûra xebatê bistînim, çewa dikarim destûra xebatê hildim? Li Tirkiyê ji bo li komeleyan bixebitin divê piştî 5 kesên tirkiyeyî xebitandin mafê wan a kesekî penaber bidin xebitandin jî heye. Lê mixabin em nikarin bixebitin, ez çewa dikarim bisîgorta li cîheke taybet bixebitim?**

- Hem ji bo suriyeyî yên di bin parastina demkî de ne û hem jî ji bo kesên di parastina nevneteweyî de ne yek tiştî dibêjim. Piştî serîlêdana parastina navneteweyî yan jî parastina demkî hate kirin 6 meh şûn de dikarî serî li destûra xebatê bidî. Ev serîlêdan wekî onlîne li wezaretxaneyê tê kirin. Ger hûn ê karê xwe bikin divê hûn bixwe serîlêdanê bikin lê ger hûn ê li cîhekî bixebitin divê serîlêdan ji aliyê kesên hûn li cem dixebitin were kirin.

- Kesê hûn li cem dixebitin piştî serîlêdanê kir wezaretxane vê serîlêdanê dinirxîne û paşê erênî yan jî neyînî serîlêdanê dibersivîne. Û ji bo li kargeheke penaberek bê xebitandin divê 5 kesê tirkiyeyî bide xebitandin. Vê pêvajoya serîlêdanê bi mehan ve didome. Bi gelemperî serîlêdana li ser sîstemê pêvajoyeke dijwar û dirêj e. Karsaz, bi piranî bi erzanî karkerên neqeyidkirî didin xebitandin û serî li destûra xebatê nadin. Serî lê bidin jî bidestxistina destûrê bi mehan didome. Ji ber vê yekê îmkana sitendina destûrê hemen hemen tuneye û ez vê rewşê jî polîtîk dibînim.  Biyaniyên li Tirkiyê ne nemecbûrî ne di karên xwedîkirina dewaran û cotkariyê de destûra xebatê bistînin. Kesên ku wê di van karan de bixebitin dikarin ji wezareta xebatê belgename ya muafiyeta destûra xebatê bistînin û bê destûra xebatê dikarin bixebitin.

**Ji bo Jinên Trans ên Penaber ên li Tirkiyê dijîn piştî ku guhertina zayendê dibin ew îbareya zayendê ya kevn li ser nasnameyê dimîne. Di demên pêşî de piştî pêvajoya guncanî ya zayendî û guhertina zayendê îbareya kevn ya di pasaportê de cîh digire dema zewacê de dibe asteng?**

- Li Tirkiyê ne tenê penaber, ji bo hemî kesên biyanî yên ne hemwelatiyê Tirkiyeyê ne ev tişt derbas dibin. Li Tirkiyê ji bo destpêkirina pêvajoya guncanî ya zayendî şert û mercên wekî mafê makezagonî û hemwelatibûnê tuneye. Piştî sitendina destûrê ji dadgehê, bicihanîna mercên piştî vê destûrê û temamkirina pêvajoyê, di nasnameyê de zayend tê sererastkirin, lê ev sererastkirin di pasaportê de çênabe. Ji ber ev guherîn di destê welatê ku pasaportê daye de ye. Piştî îbareya zayendê ya nasnameya Tirkiyê daye were sererastkirin, li Tirkiyê zewac dibe. Ji ber

vê yekê tu pirsgirêk dernakevin yanî di heyîna îbareyê ya kevn a li ser pasaportê nabe pirsgirêk. Van tiştên ku min gotin tenê ji bo Tirkiyê derbas dibin ji ber ku hiqûqa navxweyî ya her welatî diguhêre. Li Tirkiyê, îbareya zayendê ya li ser nasnameya ku ji hêla Navenda Koçê ya Bajêr tên dayîn li cihê îbareya zayendî çi nivîsandî be, li cihên fermî ew derbas dibe. Ya li ser pasaportê dinivîse ne girîng e.

**Ez bi malbata xwe re dijîm û ji ber nasnameya xwe ya zayendî ji aliyê malbata xwe ve rastî tundiyeke pir têm. Di vê mijarê de li Tirkiyê ji komele yan jî rixistineke dikarim piştevaniya parastinê hildim? Ger saziyek hebe ku bibikarîbe bibe alîkar dixwazim bi wan re têkilî deynim ji ber ku bi malbata xwe re jiyaneke pir dijwar dijîm.**

- Ji aliyê hiqûqî dikarî bibî gilîkar û xwastina parastinê bikî. Di vê pêvajoyê de komeleyên LGBTÎ+yên li Tirkiyê dikarin bibin alîkar. Komeleyên LGBTÎ+yên li Tirkiyê dikarin alîkariya hiqûqî û derûnî bidin û torên piştgiriyê yên van alîkariyan didin jî hene. Ji bo vê dikarî serî li Komeleya HÊVÎ LGBTÎ+ û Komeleya KAOS GL bidî.

**Ez iraqî me ji Bexdayê têm. Nêzîkî meh û nîvekî ye li Stenbolê dijîm. Gelo rêxistinên LGBTÎ+yên li Tirkiyê û UNCHR ji bo penaberên bi HIVê re dijîn ew çi piştgiriyan didin?**

- Dikarî serîlêdana parastina navneteweyî bikî. Ji ber ku tu iraqî ye wê serîlêdana te erênî bê bersivandin paşî statuya penaberiya bişert hildidî û heta tu derbasî welatê sêyem bibe dikarî li Tirkiyê bimîne. Piştî tu qeyid bû, ger rewşa aboriya te tunebe ku tu prîmên xwe yên sîgortayê bide, ji bo salekî sîgortaya te çêdikin. Piştî ku salekî te qediya ji bo ku tu dîsa sûd ji sîgortayê wergire, tu dikarî tevî raporên xwe serî li Miduriyeta Rêveberiya Koçê ya Bajêr ku tu lê qeyidkirî ye bidî. Bi ketina HIV+ê sedemek derbasdar e. Li Tirkiyê bihayê tedawîkirin û dermanên HIVê ji aliyê sîgortayê ve tên dayîn. Tevî vê li Tirkiyê hem ji bo tekoşîna li hemberî cûdakariya ku kesên bi HIVê re dijîn rastî tên û hem jî li ser HIVê şêwirmendiyê didin gelek komele hene. Van komeleyan hem di warê çawaniya gihîştina tedawîkirinê de û hem jî ji bo penaberan divê pêvajoyeke çewa bê şopandin piştgirî didin. Şêwirmendiya derûnî-civakî û şêwirmendiya hevrêyan jî ji hêla van komeleyan ve ji bo kesên ku bi HIVê dijîn re tên dayîn.

**Çi cûdahiya di navbera destûra rûniştinê ya turîstîk û statuya penaberiyê de**

**heye?**

- Eger hûn bi vîzeya turîstîk bên Tirkiyê, herî zêde dikarin 90 rojan li Tirkiyê bimînin. Di nava 90 rojan de hûn di nava Tirkiyê ku dikarin biçin her derê. Heta ku pasaporta we hebe hûn dikarin biçin welatekî din jî. Wekî din, hûn ne hewce ne ku ji bo derketina ji Tirkiyê tiştekî bikin. Lê dema we serîlêdana ji bo penaberiyê kir erkên we yên cûda çêdibin. Beriya her tiştî ji bo ku hûn sûd ji parastina welatê hûn hemwelatiyê wê ne nagirin serîlêdana penaberiyê dikin. Li Tirkiyê, hûn li kîjan bajarî qeyidkirîbin divê li ew derê bijîn û ji bo hûn ji ew bajarî derkevin divê hûn destûrê bixwazin. Ger ji bo we erkek hatibe dayîn hebe (wekî destnîşan, şopa tilîyan) divê hûn vê erkê bicîhbînin. Heta ku hûn biçin welatê ku hûn ê lê bicîh bibin destûra mayîne li Tirkiyê didin we. Ji bilî bicîhkirina welatekî din ger hûn bixwazin ji Tirkiyê bitemamî biçin divê hûn serîlêdana xwe ya penaberiyê betal bikin.

**Gotin ku ASAM tenê alîkariya sûriyeyîyan dike. Ji bo serîlêdanê çûm ASAMê ji min re gotin tu iraqî ye em alîkarî nadin iraqiyan. Li Tirkiyê mîna ASAMê wekî din tu komele an rêxistin hene?**

- Li Tirkiyê gelek rêxistinên di qada mafên penaberan de dixebitin hene, çend rêxistin hene ku bi taybetî li ser LGBTÎ+yan dixebitin. Komeleyên wekî HÊVÎ, KAOS GL, Sîwana Sor û Jiyana Pozîtîf bi taybetî di qada LGBTÎ+yên penaber de dixebitin. ASAM tenê alikarî ji bo sûriyeyîyan nade, alîkarî dide hemî penaberan. Li gor çavkaniyan û projeyên ku kirine qada wan a xebatê diguhêre. Komele piştgiriya aborî carinan dide Sûriyan û carinan jî dide kesên ji tundiya zayendî sax mane. Ev qadên wan ên xebatê diguhêrin. Ji bilî ASAMê rêxistinên di qadên LGBTÎ+yên penaber de dixebitin hene. Di mijara serîlêdanên penaberiyê de, ASAM nikare ne serîlêdanên penaberiyê yên sûriyeyîyan û ne jî yên kesên ji welatên din nikare hilde. Serîlêdanên penaberiyê li Miduriyetên Rêveberiya Koçê û parêzgariyan tên kirin.

**Ez dikarim çewa serîlêdana penaberiyê ya bişert li rêveberiya Koçê bikim?**

- Ji ber ku te serîlêdana Parastina Navneteweyî kiriye û nasnameya xwe hilda ye niha tu dikarî serîlêdana xwe bikî. Wê bi te re milaqat were çêkirin, di encama vê milaqatê de wê serîlêdana te bê nirxandin û biryareke erênî yan jî neyînî bê dayîn. Ger biryar erênî be li gor qanûnê tu statuya penaberiyê ya bişert digire. Di pratîkê de, gava ew diçin maseyên parastinê û hesasiyetên xwe radigihînin û bibêjin “Ez dixwazim têkevim milaqatê, ji bo bicîhkirinê hesasiyeta min heye, min têxin rêzê” dema wisa tê gotin li hin bajaran pêşanî didin. Hûn bi komeleyên wekî HÊVÎ LGBTÎ+ û KAOSê re têkiliyê datînin, li bajarê we çi praktîk heye lêkolîn dikin û li gorî wê gavan diavêjin. Ji ber di pratîkê de guherîn heye em nikarin bi teqez tiştekê bibêjin.

# VEGUHESTINA GIRÎNG:

*Dema ji aliyê rêveberiyê derbarê we de biryareke hate dayîn û bixwazin ku tiştekî bi we bidin destnîşankirin divê vê tiştî bi zimanê hûn dizanin ji we re bê vegotin, ev mafeke we yê hiqûqî ye. Ger tişekî nebêjin û bi zorê ji we re gotin ku divê hûn destnîşan bikin; hûn dikarin destnîşan nekin û bi zimanê xwe wisa bertek nîşan bidin "ez nizanim çi destnîşan dikim, ger derbarê min de tiştek hebe ez xwestina parêzer dikim, derbarê min de ger biryareke neyînî hebe ez îtîraz dikim". Ger biryareke neyînî li ser we hatibe dayîn mafê we ya temsîlkirina parêzer heye. Ger ji bo girtina parêzer rewşa we ya aborî tunebû, hûn dikarin ji baroyê bêpere xwestina tayînkirina parêzerekî bikin. Mafeke we ya wisa heye û dema we xwastina tişteke wiha kir jî divê memûr mecbûrî bike. Ev xwestina xwe wekî nivîskî bidin û heta dikarin hejmara qeydkirinê ya evraqê hildin, ger hûn nikarîbin hildin xwestina xwe li ser dokumana ji bo ku hûn destnîşan bikin jî hûn dikarin binivîsin. Vana bi rastî xwestina we dike hawayeke niviskî. Van tiştan di demên pêşî de wê destê parêzerê we yan jî destê kesên ku wê alîkariya hiqûqî bidin wê bihêztir bike. Wê di dadgehê de we bihêztir bike. Biryareke neyînî ya derbarê we de dibe ku bên bi destê xwe bidin yan jî bişînin navnîşana we, ger kesek li navnîşana we tunebe jî dişînin muxtariya ku hûn girêdayî ne. Bi van her 3 rewşan ve wekî biryar hatibe teblîxkirin dihesibînin û wextê ji bo îtaraza we ya li hember ji vê dîrokê tê destpêkirin. Girîngiya vê jî ev e;  ger di wext de hûn îtîraz nekin dadgeh serîlêdana we kontrol nake û wendahiyên mafan çêdibe. Ji ber vê yekê dîroka teblîxkirinê pir girîng e.*

*Ger hûnê piştgiriya hiqûqî hildin ji kerema xwe di vê mijarê de bibaldar bin. Navnîşana we da ye Rêveberiya Koçê ya Bajêr ku hûn lê qeyidkirî ne navnîşana we ya fermî ye. Dema di vê navnîşanê de guherîneke çêbû divê dîsa hûn Rêveberiya Koçê ya Bajêr agahdar bikin. Ev berpirsiyareke we ye. Ger hûn li vê navnîşana qeyidkiriye najîn û dema derbarê we de biryareke bişînin vê navnîşanê hûn ne lê bin û ev evraqê didin muxtar, wê demê ji aliyê hiqûqî ve wekî ev biryar gihiştibe destê we tê hesibandin. Ji ber vê yekê ger hûn ne li navnîşana qeyidkirî li navnîşaneke din dijîn ji kerema xwe vê agahdariyê bikin, ger hûn nikarîbin di demeke kin de agahdar bikin jî carinan biçin muxtariyê kontrol bikin. Mixabin gelek pratîk hene di warê binpêkirinên mafan û li hemberî qanûnê de. Bi taybetî, em şahidiya dersînorkirina neqanûnî ya penaberan dikin. Ji ber vê yekê di demên wekî dersînorkirinê ku rewşeke divê mudaxale bê kirin de, nasekî we an jî hûn rastî rewşeke wisa hatin divê bi lez xwe bigîhînin navendên alîkariya edlî yên baroyan û rêxistinên cîvakî yên sîvîl. Ji bo LGBTÎ+yên penaber jî divê xwe bigîhijinin HÊVÎ û KAOS GLyê. Ger hûn nikarîbin jî bila nasekî we têkîlî deyne. Dema ku hin tor têne çalak kirin, dibe ku encamên erênî her dem neyên girtin lê dema ku bê şopandin û mudaxale bê kirin encamên erênî tên hildan. Vana jîngirîng in, nemaze jî di pirsgirêka dersînorkirinê de.*

## VEGUHESTINA TECRÛBEYA BEŞDAR:

*Min li cihekî nivîseke xwend û pir xweşa min çû: "bi qasî te kesek nikare alîkariya te bike." Û ev gotin pir rast e. Em LGBTÎ+yên penaber daxwaza alîkariyê ji komeleyan dikin, ev mafê me ye lê ka em çi dikin divê em vê jî bifikirin. Em dibêjin ku; bila komele werin me bibînin û alîkariya me bikin. Ev ne tiştek rast e, divê em biçin van komeleyan bibînin û mafê xwe bigirin. Ger van komeleyan, komeleyên LGBTÎ+yan bin û em jî kesên LGBTÎ+ bin divê em bizanîbin û biçin mafê xwe ji van komeleyan bistînin. Belê astengiya me ya ziman heye, wekî din jî pirsgirêkên me hene lê evan komele jî di gihîştina me LGBTÎ+yên penaber de zordariyan dikşînin. Bi qasî ku ew hewl didin ji bo me bibînin hewce ye em jî hewil bidin ji bo dîtina wan. Û dixwazim vê jî bibêjim; di nava penaberên li Tirkiyê de cûdakarî heye bi taybetî jî di nava penaberên Ereb de. Penaber bi wekî navên Sûriyeyî, fasî, iraqî, misirî û hwd. ve di nava xwe de cûdakarî dikin. Ev rewşeke pir metirsîdar e, dixwazim ev cûdakarî niha bidawî bibe. Pirî caran em alîkariya aborî ji komelayan dixwazin. Ez alîkariya aborî naxwazim, kar dixwazim. Heta tu 1 TL didî min, dixwazim hînî min bike ku ez ê vî 1 TLyî çewa qezenc bikim. Dixwazim bi ew hînkirinê ez bi xwe ew 1 TLyî qezenc bikim.*

## Çalakiyên Roja Duyem:[16]

Parêzer Hayriye Kara: Li Tirkiyê Parastina Navneteweyî tê çi wateyê? Serîlêdanên xwediyên serîlêdana Parastina Navneteweyî û kesên xwediyên statu yên ku piştî serîlêdana wan tê pejirandin li Tirkiyê hinek maf û berpirsiyariyên wan hene. Li ser van tiştan ez ê pêşkeşiyeke bikim. Lê yên di qanûnê de nivisî û di pratîkê de tên sepandin dibe ku di navbera wan de cûdahî hebe. Li aliyê van cûdahiyan bêtir jî di pratîka wan de em rastî pirsgirêkên çewa tên û pirsgirêkên çewa dijîn, ez ê li ser van mijaran berdewam bikim.

Piştî ku serîlêdana Parastina Navneteweyî hate kirin hinek maf û berpirsiyariyên we çêdibin. Piştî qeyidê heta ku ji Tirkiyê derdikevî hem divê hûn berpirsiyarên xwe bicîhbînin û hem jî mafên ku hûn jê sûd wedigirin hene. Di Qanûna Navneteweyî û Biyaniyan de di sala 2019an de guhertinên girîng hatine kirin. Ez ê behsa van guhetinan jî bikim. Di meha kanûna 2019an de hin guhertin di qanûnê de hatin kirin. Guhertina neyînî ya herî mezin, têkilî sîgortaya tenduristiyê bû yanî li ser sûdwergirtina ji mafê tenduristiyê bû. Zarokên xwedî serîlêdanên navneteweyî û xwediyên hewcedariyên taybet piştî qeyida derveyî dikarin salekî sûd ji sîgortaya tenduristiyê wergirin. Piştî salekî sîgortayên tenduristiyê tên girtin; ji bo dîsa sûd jê wergire divê serîlêdan li Rêveberiya Koçê ya Bajêr bê kirin û divê ev serîlêdan di encama nirxandinê de erênî be.

Ew kesên Xwedî Hewcedariyên Taybet kî ne? Di qanûnê de Xwediyên Hewcedariyên Taybet hatine pênase kirin. Li gor vê, zarokên bitenê, kesên xwedî asteng, pîr (îxtiyar), jinên ducanî, dê-bavên tenê û bi zarok, îşkence, kesên piştî bûyera erîşa zayendî yan jî erîşa zayendî ya derûnî û fîzîkî sax mane wekî kesên xwediyên hewcedariya taybet tên pênase kirin. Li gor qanûnê, ji bo kesên xwediyên hewcedariya taybet di jêsûdwergirtina maf û karûbaran de pêşanî tê dayîn. Û ev piştî salekî girtina sîgortaya tenduristiyê ya taybet ji bo kesên xwediyên hewcedariya taybet derbas nabe. Lê, ji bo kesên ji derveyî vê pênaseya xwediyên hewcedariya taybet de dimînin, ji bo jê sûdwergirin divê encama serîlêdana wan erênî hatibe bersivandin.

Ev rewş, piştî guhertina 2019an yek ji pirsgirêkeke herî zêde ye ku em di pratîkê

[16]Çalakî di dîroka 6.05.2021an de wekî online bi farisî-tirkî-kurdî hatiye lidarxistin. Xalên koma çalakiyan LGBTÎ+yên penaber ên îranî û Kurd bûn.

de rastî dimînin. Ji ber ku rewşa aboriya penaberên li Tirkiyê, têra dayîna prîmên sîgortayê nake û girtina destûra xebatê ya bi sîgorta jî bêîmkan e.

Guhertina di sala 2019an de, yek ji guherîna herî erênî jî têkilî xala ku sererastkirina biryara dersînorkirinê bû. Li gor vê, bê nihêrîna sedema biryarê ger îtîraz ji bo dersînorkirinê hatibe kirin, heta biryara dadgehê dersînorkirin tê sekinandin. Lê ji bo îtîraza dersînorkirinê berê wext 15 roj bû niha piştî guhertina 2019an ev wext daxistin 7 rojan. Ev rewş mînakeke nihêrîna li hemberî mafan a Dewleta Komarî ya Tirkiyê ye. Ji ber ku xwestina daxistina wextê îtîrazê ji 15 rojan xistina 7 rojan, rastî binpêkirineke mafan e û tê wê wateyê ku dixwaze penaberan bilezûbez dersînor bike.

## 2.ROJA DUYEM, PIRS Û BERSIVÊN JI BEŞDARAN:

**Ez di sala 2019an de li Rêvberiya Koçê ya Bajarê Eskişehirê min xistin milaqatê û bûm penaberê bişert. Piştî wê min telefonî Neteweyên Yekbûyî kir û min bûyîna xwe ya penaberê bişert ji wan re vegot. Min xwastina xwe ya dixwazim derbasî welatê sêyem bibim ji wan re got. Bersîva ku ji wan hat jî ev bû “belê tu bû penaberê bişert lê ev ne tişteke pir girîng e”. Hate gotin “Ji bo derbasbûna welatê sêyem divê hûn niha bisekinin”. Di wan rojên borî de ji aliyê Rêvberiya Koçê ya Bajarê Eskişehirê li min geriyan û ji bo dûbare milaqateke din bê çêkirin bangî min kirin. Lê min diyar kir; jixwe ez penabereke bişert im. Milaqateke din ji bo çiye? Bersîva min ji wan hilda jî ev bû; gotin ew hevdîtineke pêşîn bûye. Di nasnameya min de penaberê bişert tê nivisandin û li Neteweyên Yekbûyî jî pejirandina min a hatiye qebûlkirin heye. Tevî van rewşan, çima dîsa ji bo milaqatê gazî min kirine û çima min hilnadin welatê sêyem?**

- Hevdîtina pêşîn, hevdîtineke ne hûrgulî ye. Di vê hevdîtinê de zanyariyên nasnamê tên hildan, sedema serîlêdanê û dema paşvegerînin welat wê çi bibe dixwazin zanyariyên wekî van tiştan hîn bibin. Ya ku piştî vê hevdîtina pêşîn çêdibe jî milaqata diyarkirina statuyê ye û ev dirêjtir didome. Ev hevdîtineke bi hûrgilî ji bo vegotina sedemên we ye. Hevdîtina we hat kirin, te satuya xwe stend û di vê demê de bawer nakin wê bandor li ser statuya te ya penaberiya bişert bibe.

Belkî ji bo stendina agahîyên nû û sererastkirina agahiyên te xwestibûn bi hev re dîsa hevdîtinekê bikin. Ji bo agahiyên berfireh dikarî ji Rêveberiya Koçê ya Bajêr bipirse. Ji ber ku carinan dixwazin hevdîtinên wisa bikin. Li bajarên cûda sepandinên cûda û sedemên cûda derdikevin holê. Ji ber vê yekê ji bo hînbûna sedema rastîn divê tu ji Rêveberiya Koçê ya Bajêr bipirsî. Lê nafikirim rewşeke neyînî hebe. Lê em bibêjin bibêjin biryareke neyînî çêbû; çewa ku te biryarê girt bê wext bi rêxistineke civakî ya sîvîl têkeve têkiliyê. Dibe ku ev Sîwana Sor be, HÊVÎ LGBTÎ+ be an jî Kaos GL be. Yanî qet nebe em bigîhêjin wextê îtîrazên ji bo biryaran û îtîraza xwe bikin, ger em negîhêjin wî wextî îtîrazên me nayin xwendin. Lê nafikirim ku wê pirsgirêkek derkeve.

**Ez jineke trans im. Li Tirkiyê min ji nexweşxaneyê ropara agahdarkirina rewşê ji bo pêvajoya guncanî ya transî girt. Ji bo aktîvasyona sîgortayê, tevî raporê min serîlêdana xwe li Rêveberiya Koçê ya Bajêr jî kir. Ji bo guhertina nasnameyê divê ez her sal raporê derxînim?**

- Li Tirkiyê raporên heyetê niha ji bo demekê nadin dayîn. Ev ropar bêdem tên dayîn; jixwe rapora agahdarkirina rewşê jî wisa ye. Lê ger Miduriyeta Rêveberiya Koçê ya Bajêr rapora agahdarkirina rewşê bixwaze, tê biçe dîsa ji nexweşxaneyê bistînî. Lê nexwazin jî jixwe wa te rapora heyetê da ye; ne hewce ye tu vê raporê jî bide. Ev girêdayê Rêveberiya Koçê ya Bajêr e dibe bixwaze an jî nexwaze.

**Ez 3 sal e ez bi partnerê xwe re li Tirkiyê dijîm. Di heman demê de ez li cem Neteweyên Yekbûyî û Rêvebiriya Koçê ya Bajêr jî qeyidkirî me. Nêzîkî 3-4 meh berê, wan ji bo hevpeyivîna pêşîn bangî min kirin li Rêvebiriya Koçê ya Bajarê Eskişehirê û ez 4 seatan di hevpeyvînê de mam. Lê tiştek jî negotin. Tiştên tenê gotin ev bûn, gotin: “li ser van tiştên we ji me re gotin em raporekê amade dikin û em ê vê rapora we bişînin Rêvebiriya Koçê ya Bajarê Enqerê; ew ê jî ji UNCHRyê û neteweyên yekbûyî re bişînin.” Paşê gotin “karê we li Rêvebiriya Koçê ya Bajarê Eskişehirê qediya.” û hîn jî nasnameya min ne guhertine. Û hîn jî ne penaberê bişert im. Sedem çiye û divê ez çi bikim?**

- Belê bi gelemperî piştî ku milaqata li Rêvebiriya Koçê dikin bi forma milaqatê û zabitnameya milaqatê raporeke amede dikin û ji Miduriyetên Giştî

yên Rêvebiriya Koçê re dişînin. Piştî encama nirxandinê biryareke erênî yan jî neyînî tê dayîn. Dema em pêvajoya covîdê ya li Tirkiyê jî difikirin, bi gelemperî li gor qanûnê piştî we serî lê da û qeyida xwe çêkir divê di nava mehekê de milaqat bê kirin û di nava 6 mehan de jî we ji bo encamê agahdar bikin. Lêbelê di pratîkê de wisa nabe. Em pêvajoya covîdê jî bifikirin 3-4 meh ne wexteke pir e. Ji bo pêvajoya diyarkirina statuyê rawestandina 3-4 mehan ne wexteke pir zêde ye; di asta nirxandinê de ye. Rêvebiriya Koçê encama serîlêdanê erênî be yan jî neyînî be divê te agahdar bike. Mixabin ji bo şopandinê malpereke tuneye. Dikarî rewşa serîlêdanê ji Rêvebiriya Koçê ya Bajêr a ku tu lê qeyidkirî ye hîn bibî. Agahiyên şaş belav bûne, tê gotin ku tu dikarî encama serîlêdana xwe ji Neteweyên Yekbûyî yan jî ji UNCHRyê hîn bibî. Lê ev agahiyeke şaş e. Ya herî rast encama serîlêdana xwe ji Rêvebiriya Koçê ya Bajêr yan jî ji Miduriyeta Rêvebiriya Koçê hîn bibin.

**Nêzîkî 5-6 meh berê min serî li Komîsyona Nexweşxane ya Osmangaziyê da û bi destnîşana 6 profesoran ve hate erêkirin. Û li gor beyana wan, ji min re wisa gotin “bi vê belgeyê tu dikarî operasyonên girtina(jêkirin) pêsîran bibî”. Û gotin ku divê herî zêde rêjeyeke kêm wekî %2 yan %3 pereyeke bê hildan û gotin ev rewş girêdayî înîsiyatifa doktoran e. Gotin dibe ku hin doktor nexwazin jî. Min serî li beşa plastîk cerrahî ya Nexweşxaneya Osmangaziyê ya Eskişehirê da û di dema serîlêdanê de min faturaya pêşîn hilda. Di faturê de ji bo fatureya pêşîn 5620 TL xuya kir. Tevî ku sîgortaya min heye çima mîktareke wisa derket? Paşê li SGKyê geriyam; min rewşê ji wan re jî got. Li gor wan “ji ber Nexweşxaneya Osmangaziyê Nexweşxaneyeke Lêkolînê ye dibe ku ji ber vê yekê be.” ji min re wisa gotin. Û min operasyon jî derbas kir. Min pereyê xwe yê operasyonê bi dijwarî da hev û min 5628 TL bihayê operasyona xwe da. Tevî pansûman û bandajê min 6550 TL da. Belê sîgortaya min heye lê ev sîgorta kêrî çi tê û çima em pêrgî rewşeke wisa tên?**

- Di şert û mercên heyî de SGK, ji bo hemî operasyonên têkilî pêvajoya guncanî ya zayendî nahêle tu bihayek bê dayîn. Lê li Tirkiyê van operasyonan li her nexweşxaneyê nayin kirin û ji aliyê her doktorî ve jî naye kirin. Ev pêvajo li nexweşxaneyên taybet jî didomin lê ji bo sîgorta bihayê wan bide divê ev operasyon li nexweşxaneyên dewletê werin kirin. Lê hinek doktor xwestina tişteke bi navê “pereyê kêrê” dikin. Di rewşên wisa de mesref derdikevin, hûn dikarin zanyariyan bi hûrgilî di rapora Komeleya HÊVÎ LGBTÎ+ ya bi navê “Cûdakarî û

Mafê Tenduristiyê” de bibînin.

**Nêzîkî 5 sal e li Tirkiyê, li bajarê Uşakê dijîm. Ji ber ev der bajareke biçûk e mixabin meriv nikare kar bibîne û bixebite. Ji ber vê sedemê nikarim debara xwe bikim. Ji bo guhertina bajarê xwe ez çûm Rêvebiriya Koçê ya Bajarê Uşakê. Min xwast ji bo karê neqilkirinê serîlêdanê bikim lê wan gotin “tu dikarî li Uşakê bimînî.” Lê gotin “ger nexweşiyeke we ya kronîk hebe û hûn di gîhiştina tenduristiyê de zordariyan dibînin, em dikarin karê neqilkirinê bidin destpêkirin.” Gotin yan jî “naseke we yê di pileya yekem de be hebe yan jî li vê derê tehdîda qesta canê we hebe hûn dikarin karê neqilkirinê bidin destpêkirin. Yan jî bajarê ku hûn dixwazin biçin ji bo xebatê pejirandina serîlêdana we hebe dîsa hûn dikarin karê neqilkirinê bidin destpêkirin.” Hate gotin “ger ev şertên we tunebin xwestina neqilkirinê nekin. Lewma ji bo çûyînê destûr naye dayîn.” Tenê ez dixwazim ji vî bajarî biçim û ev der bajareke biçûk e, nikarim kar bibînim. Ez dixwazim ji ev bajarê biçûk biçim. Heta bi dizî çûm bajareke din. Paşê hînbûm; ger ez ji sînorê Uşakê derkevim wê min dersînor bikin ji ber vê yekê tirsiyam û dîsa vegeriyam. Niha li Uşakê dijîm. Nikarim li vê derê kar bikim, dixwazim bixetibim û ji bo ez biçim bajareke din divê ez çi bikim?**

- Neqilkirina di navbera bajaran de niha pir dijwar e. Ev pêvajo bi temamî li ser Miduriyeta Rêveberiya Koçê didome. Dema tu serîlêdana niviskî jî devkî jî bikî, ew li wan krîterên ku hatin jimartin dinêrin. Tu dikarî bi diyarkirina sedemên ji ber çi tu dixwazî bajarê xwe biguhêrîne ve serîlêdaneke niviskî bikî. Lê ez nafikirim ku ew sedema nedîtina kar bipejirînin. Ji bilî nedîtina kar divê tu sedemên têkilî nasnameya xwe bibêjî baştir dixuyê. Wekî mînak bi sedemên wekî bajareke pir mihafazakar e, bajareke biçûk e, hebûna tehdîdan ji ber nasnameya xwe ya zayendî, nebûyîna li qadên civakî û hwd. sedemên pirsgirêk ên nasnameyê diyar bikî baştir dibe.

**Ez nêzîkî 4 sal e li Tirkiyê me. Dema ez di dawiya sala 2017an de hatim 22 salî bûm. Cara yekem min li Enqerê qeyda xwe li Neteweyên Yekbûyî çêkir, paşê min dan bajarê Eskişehirê. Niha li Eskişehirê dijîm. Dema nû hatim Eskişehirê ji min re gotin tu dema hatiyî 15 salî bûye û te qeyda xwe çêkiriye. Min jî got nexêr û ji min destnîşan xwastin. Di dema qeyidkirinê de min jî destnîşana xwe da wan. Nêzîkî saleke berê bû ez çûm. Ji ber**

**covîdê ji min re gotin "di makîneya me de pirsgirêk heye, dibe ku hûn neyin destnîşanê" û gotin "hûn jimareya telefona xwe deynin, em ê we agahdar bikin." Min jî jimareya xwe ya telefonê da wan û hatim malê. Piştre dema ez ji bo nûkirina nasnameya xwe çûm Rêveberiya Koçê ya Bajêr li wê derê ji min re gotin dosyaya te hatiye girtin. Wekî sedem jî gotin tu neçûye destnîşanê; ez hînbûm ku biryara dersînorkirina min derxistine, min wextên pir dijwar jiya. Min ji her derê alîkarî xwast lê kesek alîkariya min nekir; çûm dadgehê jî. Piştre ÎKGV alîkariya min kir; ji bo min ji nû ve bi dosyayeke nû me serîlêdanê kir û di dosyayê de hatina min wekî 2020an hate xuyakirin. Paşê dema ez çûm Rêveberiya Koçê ya Bajêr ji min re gotin "ji ber ku hûn nû hatine em nikarin bi we re hevdîtinê çêbikin" û li Rêveberiya Koçê ya Bajêr rastî homofobiyê hatim. Û niha ez 27 salî me. 4 sal e ez li vê derê me û kesek bangî min ê milaqatê jî nekir. Û dixwazim ev a jî lê zêde bikim, li dadgehên Tirkiyê min 2 caran red kirin û ji ber biryar neyînî bûn 2600 TL ceza dan min. Ji ber perê min tunebû min cezayê xwe neda. Haya Rêveberiya Koçê ya Bajêr jî jê heye û ez li Eskişehirê jî jiyam. Li vê derê di qursa kuaforê de qeyda min heye û her roj diçim qursê. Her roj ji bo destnîşanê ba min kirin û ji ber ez neçûm destnîşanê ceza ji min re nivisandin, min neda. Hem dosyaya min ji ber di sala 2020an de vebûye min pirsgirêkan jiya.**

- Ji ber niha tu xwedî serîlêdanê ye û li gor tu dibêjî nasnameya te jî heye. Li gor qanûnê di rewşeke wiha de divê Rêveberiya Koçê ya bajêr bi te re milaqateke çê bike. Lê di nava bajaran de cûdahî çê dibin. Divê tu biçe Rêveberiya Koçê ya bajarê tu lê ye, li gor rewşê û mijarên hestyar dibe pêşanî bidin milaqatê. Ev 2600 TL ji bo ku doz hatiye redkirin, destheqa wekaleta parêzer e. Ger tu ev pereyê wekaletê nedî, ger qezenceka te hebe dikarin desteser bikin. Carinan jî dema derbasbûna welatê sêyem beriya ji welat derkevî, di stendina belgeya derketina derveyî welêt de dibe ku pirsgirêkan derxînin. Heta tu deynê xwe nedî dikarin ji bo derkatina derva pirsgirêkan derxînin. Lê ger pêvajo dirêjtir bibe li ser vê destheqa wekaletê faîza qanûnî tê çêdibe.

**Dixwazim derbasî welatê sêyem bibim. Lê li vê derê xwediyê cihê ku lê dixebitim, ji min re got ez ê destûra te ya xebatê derxînim û vê destûra xebatê ya min derxistiye wê di dema derbasbûna welatê sêyem de li ser dosyaya min tu zirara wê hebe yan na?**

- Rêza derbasbûna welatê sêyem li gor hasasiyetan dibe. Kesên ku li Tirkiyê

destûra xebatê bistînin ji bo derbasbûna welatê sêyem baş dibe yan na? Li ser vê mijarê tiştekî teqez meriv nikare bibêje lê li Tirkiyê heyîna destûra te ya xebatê, li ser standartên jiyana li Tirkiyê bandoreke mezin dike. Ji Tirkiyê derbasbûna welatê sêyem carinan wekî meriv difikire hêsan nabe û dibe ku di demeke nêzîk de jî nebe. Carinan di 3 salan de carinan jî kesên 7-10 salan disekinin jî çê dibin. Ji ber vê sedemê di wateya ji bo başkirina şertên jiyana li Tirkiyê de, heyîna destûra xebatê baş dibe. Li Tirkiyê, ji bo sekinîna li ser mafan girtina te ya destûra xebatê pir girîng e.

**Li Rêberiya Koçê gelek caran em rastî tevgerên nijadperestî, transfobîk û homofobîk tên. Em vê rewşê çewa dikarin gilî bikin?**

● Mixabin li Tirkiyê, di gilîkirina rewşên wekî homofobîk û transfobîk de bêcezabûn heye. Lê di rewşên wiha de meriv dikare ji Mudiriyetên Rêveberiya Koçê re arznameyên gilîkirinê binivisîne yan jî dikare li 157 YÎMERê (Navenda Ragihandinê ya Biyaniyan) bigere. Navendeke ku bi 9 zimanên cûda şêwirmendiyê dide. Ne tenê ji bo şêwirmendiyê ye, hûn dikarin ji bo gilîkirinê jî lê bigerin. Li vê navendê, hûn dikarin wekî anonîm jî gilîkirina xwe bikin. Yanî di dema gilîkirinê de hûn dikarin nav û paşnava xwe ya rastîn nebêjin. Lê carinan di gihiştina 157 YÎMERê de pirsgirêk derdikevin, em vê jî jibîr nekin.

**9- 3 sal e ez û partnerê xwe bi hev re li Tirkiyê dijîn. Ji bo derbasbûna welatê sêyem me bi hev re serî li gelek komeleyan da. Lê tu komele jî negotin em dikarin bibin alîkar. Ji aliyê UNCHRyê bicîhbûna min ji bo Îspanyayê derket. Lê xwastina derbasbûna welatê seyêm a partnerê min erênî nebû. Partnerê min bi penceşêra troîdê ye û tedawî dibe. Ji ber pandemiyê tedawi jî dewam nake. Derziya covîdê ya yekem bû niha em li benda derziya duyem in. Û ez ji Neteweyên Yekbûyî alîkariya aborî digirim. Lê partnerê min nagire. Ger ez biçim wê partnerê min kengî were? Gelo niza cîhek heye ku di vê mijarê de pişgiriya me bike?**

● Mixabin ji ber li Tirkiyê rewşa partnerî ne zewaca fermî ye, ev weke rewşeke fermî naye hesibandin. Ji ber vê sedemê weke yek dosye naye xuyakirin, dosye cûda tên vekirin. Lê hûn dikarin bi partnerê xwe re daxwaza pêvajoya bi hev re bikin an jî daxwaza çûyîna yek welatî bikin.

## VEGUHESTINA BEŞDAR:

*2 sal berê ji aliyê Rêveberiya Koçê ya Bajêr ji bo hevdîtinê bangî min kirin û ji min re gotin "di nava sê mehan de em ê ji bo milaqatê bangî we bikin." Lê ji bo milaqatê ba min nekirin. Vê salê ji bo nûkirina nasnameyê ez çûm Rêveberiya Koçê ya Bajêr. Lê ji min re wisa gotin "ji ber ku tu ji bo milaqatê nehatiye vexwandin em nikarin nasnameya te nû bikin". 2 meh berê jî ji Neteweyên Yekbûyî li min geriyan; hevdîtinek li ser telefonê bi min re kirin. Dosyaya min ji bo hevdîtinê hildan; di dosyaya min de tişteke li ser derbasbûna min a welatê sêyem nanivise. Tenê nivisandine dosye di bin parastinê de ye .*

**Parêzer Hayriye Kara:** Ez nikarin tişteke li ser bicîhkirina welatê sêyem bibêjim. Bicîhkirin tişteke derveyî hiqûqa Tirkiyê ye, tişteke girêdayî welatên sêyem e. Dema lîste tên amadekirin behsa gelek tevgerên hasasî dikin. Û niha jî gelek penaber hene li benda bicîhkirinê ne lê ji gor ji me re tê gotin kotaya welatên ku ji Tirkiyê penaber digirin pir kêm e, ji bilî kesên rewşa hasasî kesek hilnadin. Ji ber em têkîlî pêvajoya bicîhkirinê nabin mixabin nikarim bi hûrgilî bersîva van pirsan bidim. Wekî komeleya Kaos GLyê li ser nijara bicîhkirinê gelek pirs ji me tên kirin. Ji me re daxwaznameyên têkilî bicîhkirinê yên daxwaziyên wan tê de cîh digirin ku bi zimanê xwe nivisandîne tên. Em qet daxilî van daxwaznameyan nabin û rasterast dişînin UNCHRyê. Û li ser vê bicîhkirinê pir zêde agahiyên çewt hene. Divê bawerî bi her gotinê neye kirin. Li Tirkiyê tevî Kaos GL jî rêxistinên cîvakî yên sîvîl nakevin nav vê pêvajoyê.

# DAXUYANIYA XWESTINÊN LGBTÎ+YÊN PENABER[17]

**01** Astengiya zimên a ku li pêşiya me, nahêle LGBTÎ+yên penaber beşdarî xebatên LGBTÎ+ bibin û dibe asteng xwe bigihînin perwerdehiyên LGBTÎ+. Misogerkirina têgihiştin û pirzimaniyê ku di nav wan de divê Erebî, Farisî û Kurdî hebe û vekirina cîh ji bo kesên LGBTÎ+ di çalakiyên ku dê werin lidarxistin û xebatên bêne weşandin de,

**02** Di kesayeta LGBTÎ+yên penaber de komele, înîsîyatîf û rêxistinên LGBTÎ+ yên polîtîkayên wan tune ne pêşxistina “polîtîkayên LGBTÎ+yên penaber ên tevgirtî” were kirin, û bi tevlîbûna me LGBTÎ+yên penaber ya vê pêvajoya pêşxistinê,

**03** Komele, înîsiyatîf û rêxistinên LGBTI+ di mekanîzmayên biryargirtinê de ji LGBTI+yên penaber re cîh vekin,

**04** Komelên, însîyatîf û rêxistinên LGBTI+ budçeyek ji bo xebatên LGBTI+yên penaber ji budçeyên xwe veqetînin û me LGBTI+yên penaber jî têxin nav vê pêvajoyê,

**05** Piştî pandemiyê cîhên çalakî û civînê yên LGBTİ+yan vekirina ji bo bikaranîna LGBTI+yên penaber, tevlîbûna LGBTI+yên penaber di xebatên hevpar ên LGBTI+yan de ku di kanalên ewle de di dema pandemiyê de tên meşandin,

**06** Komele, înîsiyatîf û rêxistinên LGBTI+ ji bo “xebatên xwe-rêxistinkirina LGBTI+yên penaber” piştgiriya LGBTI+yên penaber,

**07** LGBTI+yên penaber ên bi HIVê re dijîn jî bi HIVfobîyê re rû bi rû dimînin. Di xebatên ku wekî nimûneyek têkoşîna li dijî fobiyê wê werin amadekirin de, LGBTI+yên penaber ên bi HIVê re dijîn divê neyin jibîr kirin û têkevin nav vê pêvajoyê,

08 Serdema pandemiyê LGBTI+yên penaber bêhtir tenê hişt û nedîtbar kir. Ji bo ku serderî li van pirsgirêkan bikin divê ji bo LGBTI+yên penaber bi zimanê wan ê zikmakî alîkariya psîkolojîk bê dayîn, xizmetên ku di vê qadê de tên dayîn jî bên berfirehtir kirin,

09 Li Tirkiyeyê LGBTÎ+ her dem rastî cûdakariyê tên. Di kesayeta penaberan de nijadperestî jî li vê cûdakariyê zêde dibe. Ji bo têkoşîna li dijî vê cûdakariya piralî û binpêkirinên mafên din ên hiqûqî, gihîştina torên piştgiriya hiqûqî yên belaş, bi zimanên me (Erebî, Farisî, Kurdî) şêwirmendiya hiqûqî were dayîn, di vî warî de zêdebûna karûbarên kêm,

10 Krîterên kar ên biyanî yên heyî qadên xebitandinê yên LGBTI+yên penaber teng dike û ji bo wan peydakirina destûra kar dijwartir dike. Ji bo afirandina qadên kar ji LGBTI+yan re, rêxistinên ku di verastkirina krîteran de li ser vê mijarê berpirsiyar in û ger mimkun be di dema girtina kar de di mijara kotaya LGBTI+yên penaber de ji bo alîkariyê cîh bigirin,

11 Penaberên trans ên ku li Tirkiyê dijîn rastî tundiyê tên. Penaberên trans cîheke ku lê bixebitin qet nabînin. Di gihîştina hormonan û pêvojaya guncanî ya zayendê de, heta tenê ji ber navên xwe jî pirsgirêkan dijîn. Neçar dimînin ku li hemberî van pirsgirêkan tena serê şer bikin. Di kesayeta penaberên trans de divê zêde xebat bên kirin û xizmetên ku bi sînordarkirî tên dayîn bi hêsanî bên gihîştin,

12 Pirsgirêkên ku LGBTI+yên penaber rû bi rû dimînin nayên dîtin an jî naxwazin bibînin. Ji ber vê sedemê divê bi tevlîbûna LGBTI+yên penaber ên di komele, înîsiyatîf û rêxistinan de cîh digirin li Tirkiyê avakirina komeke xebatê ya LGBTI+yên penaber û li hemberî pirsgirêkên hevpar destpêkirina kampanyayan,

13 Mafê parastina xweşhaliyê mafek bingehîn a mirovî ye. Tevî vê yekê ji bo afirandina polîtîkayên civakî bi beşdarbûna me LGBTI+yên penaber bi pêşengiya koma xebatê ya li Tirkiyê çêkirina toreke navneteweyî ya LGBTI+yên penaber,

**14** LGBTÎ+yên penaber hatine neçar kirin ku bi salan li Tirkiyê bisekinin ji bo derbasî welatek sêyemîn bibin. Bendewariyên dirêj dibin sedema bêxîretî û fikaran. Di ev tora navneteweyî ya LGBTÎ+yên penaber de bê bahaneya pandemiyê bicîhkirina welatên sêyemîn û ji bo bilez were kirin li sazî û komaran bi meqseda mekanîzmayên bandorkirinê kampanya bên dest pê kirin, di ev kampanyayan de cîhgirtina komele, înîsiyatîf û rêxistinên LGBTÎ+yên penaber,

**15** Ji bo pêşîlêgirtina cûdakarî û LGBTÎ+fobîya ku LGBTİ+yên penaber dijîn bi Rêvebiriya Koçê û UNHCR (Komîseriya Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî) re danîna têkiliyê ji bo pêkanîna civînan,

**16** Di kanalên medyayên civakî yên alternatîf ên wekî Youtube, podcast û hwd de çêkirina xebatên li ser LGBTÎ+yên penaber û pirsgirêkên ku ew dijîn, piştgirî dayîna me LGBTÎ+yên penaber ku dixwazin van xebatan bikin.

**[17]Ev beş ji bernameya “17ê Gulanê di Kesayeta LGBTÎ+yên Penaber de Hevdîtinên IDAHOBIT -VI” ku 16-17 Gulana 2020an de ji aliyê LGBTÎ+yên Penaber ku hatibûn cem hev hatiye amede kirin. https://kaosgl.org/haber/multeci-lgbti-talepler-bildirisi-bes-dilde-yayindahttps://www.gazeteduvar.com.tr/multeci-lgbti-talepler-bildirisi-5-dilde-aciklandi-haber-1523679 (0üçüncü06.2021)**

HÊVÎ LGBTÎ

RAPORA DI SERDEMA ŞEWBA COVÎD-19AN DE LGBTÎ+YÊN
PENABER Û BINPÊKIRINÊN MAFÎ YÊN JIYANE